

The Hall ^{KURDÎ}

NFT

[NON-FUNGIBLE TOKEN]
TOKENÊN NE-GUHÊRBAR



■
TheHall_{kurdî}

E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 2, Sibat 2022

■
Damezrîner

Osman Kômürçü
Erol Başak

■
Editor

Erol Başak

■
Rûpelsazî

Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com


■
Bergsazî

GrafîKURD

■
The Hall Kurdî Endama
Koma Kovargerên Kurd e

■

**JI BO JIYANEKÊ
BIGUHERÎNÎ
DAREK DANE**
Da ku ji bo hawirdoreke
hêşîn û ji bo kesên
ji cihên xwe bûne
pêşerojeke domdar
ava bikî




*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.
Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe berpirsin û ne mecbûr in ku ew mîna yê weşanger û
edîtor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam, materyal û naverokên din bi niyeteke safî hatine amadekirin.*

NAVEROK



Nameya
Edîtor

Erol Başak
4



Resmên Nû Yên
Windayî Yên Cizîrî

Necat Zivingî
14




NFT Çi Ye Çawa
Dixebite?

The Hall Kurdî
5



Peymana Enqereyê
Serpêhatiya Dixtorên
Kurd Gezo û Îzzet
Bozkurt

The Hall Kurdî
17



Trenda Nû NFT
Hevpeyvîn ligel Koshe
Salayî

The Hall Kurdî
8




Li Dijî Xizaniyê
Daran Biçîne!

Daleel Hagy
21



Li Qazaxistanê Çi
Qewimî?
Hevpeyvîn Ligel Narîn
Nadirovayê

The Hall Kurdî
11



Li Te Difikirim

Zana Zengenî
24

NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

Merheba xwînerên hêja û dildarên zimanê Kurdî.

Bi jimara meha Sibatê kovara me The Hall Kurdî ji bo xwendinê amade ye û li ber destê we ye.

Di vê jimarê de mijara me ya sereke hunera NFTê ye. Me ev mijar kir berga kovarê. Lewra dinya bi lez û bez ber bi cihaneke nû ya sanal ve diçe. NFT ango hunera krîpto, trena herî balkêş ya salên dawîn e. Herî zêde jî di sala 2021ê de derket pêş. Par di 11ê Adarê de Mike Winkelmann ku wek “Beeple” tê nasîn berhemeke xwe ya NFTê bi 69.3 milyon dolarî firot. Ev girîngiya vê hûnerê jî nîşan dide.

Ciwanên Kurd jî di vê qadê de bi hûnerên xwe ve balê dikşînin. Keçeke Kurd a jîr û jêhatî Koshe Salayî digel 2 hevalên xwe hesaba NFTKURD damezrandiye. Di vê jimarê de bi artîsta NFTê û damezrînera hesaba NFT-KURDê Koshe Salayî re hevpeyvîneke me jî heye. Meraqdarên NFTê an jî kesên ku nû bi NFTyan dihesin dê bikarin ji vê gotara ku bi zimanekî zelal û têgihîştî hatiye nivîsîn hûrguliyên vê hûnerê hîn bibin.

Bûyerên li Qazaxistanê, yekem rûdana navdewletî ya sala nû bû. Bê gumana herkes meraq dike ka sedem çi bû û dê piştê çi bê? Lê rewşa Kurdên li wir jî cihê meraqê bû. Loma me jî pirsên xwe ji xanima karsaz û çalakvana Kurd Narîn Nadirovayê re şandin.



Wê jî bi bersivên xwe ji me re bi Kurdî û bi kurtî behsa meselê û rewşa Kurdên Qazaxistanê kir.

Dîsa di vê jimarê de hûn ê serpêhatiya du bijîşkên Kurd ên serkeftî bixwînin. Gezo û Îzzet Bozkurt bi Peymana Enqereyê hatine Îngilîstanê. Hedef û hêviyên wan, jiyana wan a li Amedê û serpêhatiya wan a li xeribiyê hêjayî xwendinê ye.

Di kovara meha Sibatê de projeyekê alîkariyê jî em didin nasîn. Daleel Hagy civanekî ji Rojavayê Kurdistanê ye. Wî projeyeke dar danîne hazir kiriye ji bo Bakurê Rojhilata Sûriyê û Herêma Kurdistanê. Daleel projeya xwe li Londonê daye destpêkirin û bi vê projeyê dixwaze alîkariyek bigihîne deverê û kesên ku ji warê xwe bûne û her wiha herêmê bike ciheke hêşîn.

Babeteke girîng û hêja jî nivîskar Necat Zivîngî nivîsand. Mamoste Zivîngî di gotara xwe de balê dikşîne ser aliyekî din ê Melayê Cizîrî, behsa “Resmên Nû Yên Windayî Yên Cizîrî” dike û Cizîrînasiyê radike qonaxeke nû.

The Hall Kurdî vê mehê jî ji bo xwendinê têr û tije ye.

Bi Kurdî bixwînin, tehmê jê hilînin.

Bimînin di xweşiyê de.

NFT

[NON-FUNGIBLE TOKEN]

HUNERA LI SER BLOCKCHAINÊ

Çi ye? Çawa dixebite?

The Hall Kurdî



NFT bi navê xwe (**non-fungible token**) an jî bi kurdî (**tokenên ne-guhêrbar**) rêbazeke krîptografiyê ya ji bo daneyan e. NFT nîşan dide ku berhemeke dijîtal nikare bê kopîkirin û tu tişt nikare têkeve cihê wê. Ev yek li ser heman teknolojiya blockchainê ye û li ser lînûskeke dijîtal daneyan dide qeydkirin, erêkirin.

Bi kurtasî mirov dikare bi rêbaza NFT'yê bike ku xwediyê dane yan jî berhemeke dijîtal kesekî tenê be.

NFT ji bo nîşankirina wêne, vîdeo, deng û dosyeyên din ên dijîtal tê bikaranîn. Ne tenê ev, gelek tiştên ku li ser platformên dijîtal tîn meşandin li ser NFT'yê jî dikarin bê meşandin. NFT perçeyekî teknolojiya blockchainê ye. Ev her du bêyî hev nabin. Bo nimûne daneyek an jî berhemeke hunermendekî/ê bi riya NFTyê dikare dest biguherîne û bi riya blockchainê jî bê teqezkirin ku xwediyê wê, hilberînerê wê kî ye.

Di alema blockchainê de her tişt tê şifrekirin. Her şifre bawerî, her tomar jî delîl e. Hêsan e ku ev delîl ji aliyê hemû kesan ve bê dîtin.

NFT wekî Bitcoin û pereyên din ên krîpto blockchainê bi kar tîne. Ev teknoloji jî danûstandinan li ser lînûskeke tomar dike.

NFT bi şoreşa krîptoyê zûde ye dihat sêwirandin lêbelê di sala 2021ê de zêdetir popûler bû. Gelek torên blockchainê yên ku nû derketin êdî torên xwe li gorî çapkirina NFT'yan eyar kirin. Gelek blockchainên berê jî heman guhertin kirin û tora xwe li gorî rêbaza NFT'yê ji nû ve sererast kirin.

Ethereum yekem tora blockchainê ye ku bi standarta ERC-721ê kir ku li ser tora wê NFT çap bibe ango were tomarkin. Piştî Ethereumê Solana, Avalanche, Flow, Tezos, Ziliqa û Cordano hene ku ew jî li ser zincîra xwe piştgiriya afirandina NFT'yê dikin.



ÇI YE?

NFT AN JÎ TOKENÊN NE-GUHÊRBAR

YEKANE YE
her daneyek cudahiya xwe
ya ji yên din nişan dide

TÊ TESCÎLKIRIN
bi saya zîncîra blok
xwedîtiya wê tê tescîlkirin

KÊMDÎTÎ YE
pêşvebir dikare lîmît
û hejmara wê diyar bike

TÊ TRANSFERKIRIN
NFT li her derê bi hêsani û azadî
tê kirin û danûstandin

NAYÊ DABEŞKIRIN
NFT tu caran nabe perçeyeke biçûk,
her tim yekpare ye

EWLE YE
li pêşiya hemû
sextekariyan digire



Dinya bi teknolojiya Web3'yê êdî di qonaxeke nû re derbas dibe. Blockchain, NFT, metaverse, pereyên krîpto. Ev peyv di jiyana rojane de edî li ser zimanê gelek kesan in. Baş e NFT çi ye? Ji bo çi ye? Di vê cîhana nû de Kurd çiqas hene? Me ev pirsên xwe ji artîsta NFTê û yek ji damezrînerên NFT-KURDÊ Koshe Salayî re şandin. Vaye bersivên wê yên balkêş ji bo meraqdarên NFTyan.

HEVPEYVÎN LIGEL KOSHE SALAYÎ

Artîsta NFTê
û Yek Ji Damezrînerên
NFTKURDÊ

NFT çî ye û bi kêrî çî tê?

NFT tokenên neguhêrbar in. Ev cureyeke daneyan e ku di block-chainekê de tîn veşartin, nayên guhertin lêbelê meriv dikare lê zêde bike. Ev serdemeke nû ye ji bo peydakirina sertifikaya rastbûyîne an jî delîla xwedanetiyê. Ev amûr li dijî kopîkirin an jî dizîne berhemên artîstan diparêze. Lê ez di wê baweriyê de me ku em hê negihîştine wê qonaxê da NFT di web3'yê de ji sedî sed çalاک bîn bikaranîn.

Mirov çawa dikare NFT'yan peyda bike?

Pêşî pêdiviya we bi cizdaneke (wallet) krîptoyê ya wekî Metamaskê heye. Wê, bi krîptoya ku platforma NFT'ê qebûl dike wek Ethereum (ETH)ê bar bikin, cizdana xwe bi platformê ve girê bidin da ku hûn NFT'ê bikirin, li ser erdan li metaversê veberhênan bikin û domainan bikirin. Her gavê projeyên hunerî yê kolektîf ên nû derdikevin û hem jî hunera xweşik a hêzdar 1/1 hene ku bi karûbarên mezin bêhna mirov diçikîne.

Kîjan torên blockchaninê ji bo NFTê baştir in, mirov dikare çawa NFTê biafirîne?

Gelek platform hene ku destûra nîşankirina perçeyekî hunerî yan belgeyê didin. NFT bi peymanên bîaqil ên ku ne navendî ne tîn afirandin. Favoriya min tune, lê platforma herî populer Opensea ye. Platformên din ên ku divê meriv lê temaşe bike Solanaart û Kalamint in.

Peywendiya NFT û Metaverse çî ye, NFT wê di Metaversê de bi kêrî çî bê?

Metaverse wê derfetê dide me da ku em bûyer û şewazên jiyane lê biceribînin. Em ê li wir bin da ku daxuyaniyan bidin û pêwendiyê nû çêkin dema ku hîn jî bi hevalên ku em bi wan re pir hevpar in ve girêdayî bin. Ji bo ku ev çêbibe em hewceyê hin tiştan in; mîna huner, cil û bergên dijîtal ji bo avatarên me û tokenên din



ên neguhêrbar ku kirasekê li mal, dikan û galeriyên xwe yê li metaversê bikin. NFT dê ji bikarhêneran re bibin alîkar ku wê ezmûnê ji bo wan û temaşevanên xwe biafirînin.

NFT çawa popûler e û eleqeya kurdan a ji bo wê çî ye?

Bazara NFT û metaversê hêj jî li gerdûnê sûkeke pir girîng e. Heta niha eleqeyeke mezin bi bikarhênerên kurd re nîne. Lêbelê, civata hunermendên kurd ên NFT'yê her roj mezin dibe. Bi dîtina min divê em mîmar û hunermendên metaversê yê kurd li vir amade bin û ji bo hatina bikar-



NFTKURD

hêner/temaşevanên kurd ezmûnan amade bikin. Pêşbîniya min ew e ku wê di dawiya sala 2022yan de werin.

Tu xudana NFTKURDê yî. Armanca rûpela we ya li ser NFTyê çi ye?


NFT Kurd şîrketeke pêşerojê ye ku bala xwe dide huner, muzîk û edebiyata kurdî da ku di metaversê de azmûna xwe bigihîne beşdarên global. Armanca me ew e ku em di metaversê de di navbera huner-mendên kurd ên NFT û gerstêrka dinê de xaleke hevdiîtinê çêbikin. Em di vê cîhana nû ya web3 ya tîjî kelecana de ji bo parastin û pîrozkirina huner û edebiyata Kurdî pir bi çûş in.

Ev pirs min a dawî ji bo xebatên te yê şexsî ne. Tu çi cure NFTyan diafirîni? Ji kerema xwe re tu dikarî ji me re hinekî behsa xebatên xwe bikî?

Ez 1/1 NFT-yên hunera xweşik diafirînim. Hunera min warên giyanî vedikole û di derbarê femînîzmê de referansên pir xurt nîşan dide. Ez rêwîtiya jinê dişopînim. Zehmetî, têkçûn, serkeftinên wê û hilkişîna giyanê. Niha, ez li ser berhevokeke bi navê Ascensiona Femînîst ku li ser platforma Foundationê heye dixebitim. Femînîst Ascension ji 44 tabloyên jinan pêk tê ku çîrokên cuda vedibêjin. Heta niha du tablo hatine belavkirin û yê mayî dê di nava sala 2022an de werin belavkirin.

Gelek spas Koshe Salayî ji bo bersivên te yê balkêş û ez ji te re di vê cîhana nû de serketinê dixwazim.

Gelek spas ji bo vê derfeta hevpeyvînê. Serkeftin ji bo we û kovarê. Ez bi kelecana li hêviya xwendina hejmara sibatê me.



Ascensiona Femînîst



LI QAZAXISTANÊ ÇI QEWIMÎ Û REWŞA KURDÊN LI WIR ÇI YE?

Di rojên ewil yên 2022yan de li Qazaxistanê tevliheviyek çêbû. Ji ber bihabûna gaza sirûştî xelkê dest bi protestoyan kir. Lê protesto dûv re bûn tundî û talan. Çalakvanan êrîş bir ser avahiyên hikûmetê. Esker û polîsên wî welatî bi tundî mudaxele li çalakvanan kir. Bi sedan kes mirin, bi sedan kes birîndar bûn. Bi hezaran meriv hatin binçavkirin. Serokkomarê Qazaxistanê Qasim Comert Tokayev rewşa awarte îlan kir û ji Rêxistina Peymana Ewlekariya Kolektîf alîkariya eskerî xwest. Eskerên Rusyaya ku endamê vê rêxistinê ye ketin Qazaxistanê. Bi alîkariya vê hêza ji derve hatî, hikûmetê welat dîsa kontrol kir. Sedem çî bû, gelo bûyer safî bû, rewşa kurdên li wir çî ye? Ji bo ku meseleyê hîn bibin û ji rewşa civa-ka Kurdên li Qazaxistanê haydar bin me xwe gihand çalakvan û karsaza Kurd Narîn Nadirovayê. Wê bersivên pirsên me wiha dan. Va ye hevpeyvîna me li gel xanima hêja Narîn Nadirovayê.

Qazaxistan welatekî çawa ye, çima girîng e?

Qazaxistan welatekî li Asyaya Navîn e. Cînarê Rûsya, Çîn, Tirkmenistan, Ozbekistan, Qirgizîstan, Gola Hezarê û Gola Aralê ye. Navê wê yê fermî Komara Qazaxistanê ye. Li seranserê dinyayê di warê mezinahiya axê de, welatê 9emîn e. Lê nifûsa wê li gorî axa wê ya berfireh kêr e. Li gorî daneyên fermî yê sala 2020an nifûsa Qazaxistanê li dora 19 milyon e. Li Qazaxistanê beşeke girîng a nifûsê rûs e. Lê kurd jî di nav de li vî welatî zêdeyî 100î mîlet he ne.

Li Qazaxistanê çi diqewime?

Li Qazaxistanê hê jî tam ne zelal e çi diqewime. Lê rastiyek he ye ku ji avakirina komarê heta niha, yanî ev bêhtirî 30 sal in gelek problem ketine ser hev. Problema aboriyê herwekî li seranserê dinyayê xuya dibe, li vî welatî jî bi awayekî zelal û berbiçav diyar dibe. Herwiha beşeke girîng ji hemwelatîyên Qazaxistanê diyar dikin ku dewlemendî û hatina welatê wan, bi awayekî adilane di nav hemwelatîyan de nayê parvekirin. Li aliyê din fikrek jî ew e ku dewlemend dewlemendtir dibin û feqîr feqîrtir dibin.

Ev serhildan e, soreş e yan destê welatên din tê de he ye?

Li gorî min ne serhildan e, ne jî şoreş e. Sedema vê yekê ku ez difikirim, di bersiva pîrsa yekê de min gotiye. Lê hê gelekî zû ye. Em nizanin di rojên pêş de wê çi biqewimin. Vê gavê sedemên sereke ku xuya dibin, birçîbûn û bihabûna li nav welatê û nerazîbûna ji desthilatdariyê ye ku di nav beşeke pir hindik de hatiye dabeşkirin ango parvekirin. Helbet li welatê ku demokrasî lê tune ye yan jî pir hindik e, her dem destê kes, sazî, dezgeh û welatan hebûye û ihtîmalek e ku li Qazaxistanê jî rewşeke bi vî awayî he be.

Hêrsa gel ji ber çi ye?

Hêrsa gel beriya her tiştî ew e ku dibêje: “Ez welatekî pir zengîn im, welatê min li ser petrol û gazê ye, lê çima ez feqîr im?” Li gorî baweriya min



sedema sereke ev e ku mîlet difikire dewlemendî û hatina welatê bi edaletî nayê parvekirin. Bi gotineke din, herwekî min berê jî got, Qazax difikirin ku dewlemend dewlemendtir dibin, lê feqîr feqîrtir dibin...

Wisa dixuye ku hikûmetê kontrol bi dest xistiye. Lê bi rastî jî talûke xilas bû yan na?

Vê gavê rewş aram e û hêviya me ew e ku aramtir bibe û kesek zîrar û ziyane nebîne, kuştin û birîndarbûn zêdetir nebe. Mixabin heta niha bi sedan kesan jiyana xwe ji dest daye, hejmareke zêde birîndar he ne û bi hezaran kes hatine girtin û bivçavkirin. Vê gavê kontrola hikûmetê he ye, lê hê zû ye ku em bibêjin xetere xilas bûye.

Di pêşerojê de li ber Qazaxistanê çi he ye?

Di pêşerojê de pêwîst e ku li Qazaxistanê demokrasî û edalet pêk were. An na her dem dibe ku tiştên wiha nexweş pêk werin. Ev rewş ji bo tevahiya dewlet û hikûmetan wiha ye. Gava mîletê te ne razî be, birçî be, edalet tune be, demokrasî tune be, tu nikaribî zikê hemwelatîyên xwe têr bikî, ihtîmaleke mezin îro nebe, sibe; sibe nebe dusibe wê nexweşî û tevgerên wiha derkevin.



Û rewşa Kurdên Qazaxistanê çi ye?

Rewşa Kurdên Qazaxistanê normal e. Bi awayekî aqilane tevgeriyan û derneketin kûçe û kolanan. Li malên xwe, li gund û bajarên xwe man. Kurdên Qazaxistanê her dem piştvanên hikûmetê û piştvanên aştî û biratiya bi milletên din re bûne. Kurd baş dizanin ku gava tevliheviyek derkeve, beriya pêşî wê milletên di nav dewleta Qazaxistanê de zirarê bibînin. Dizanin ku tevlihevî wê zirarê bide wan jî. Lê gava aramî he be, bi giştî rewşa kurdên Qazaxistanê baş e, li ser karên xwe ne û li gorî milletên din, herwiha li gorî gelek Qazaxan jî baştir dijin.

Kurd di vê qeyranê de li kîjan aliyê ne?

Kurd li aliyê aştî û aramiyê ne. Lukseke kurdan tuneye ku di rewşeke wiha tevlihev û aloz de bibin aliyê hinekan. Kurd li her derê dibêjin: "Xwedê avekê li vî agirî bike û Xwedê aştî, edalet û yekitiyê bide vî welatî ku em jî tê de ne."

Civaka Kurd dê bikaribe muhafaza xwe bike?

Şikir 80 sal in di nav şert û mercên gelekî dijwar de kiriye û wê ji niha pê ve jî bike...

Di pêşeroja Qazaxistanê de çi li ber Kurdan e?

Helbet tu caran Qazaxistan nabe welatê kurdan, bivê nevê problem he bûne û wê he bin jî. Tevlihevî ne tenê bi kêrî Qazaxan, bi kêrî kurdan û hemû milletên din jî nayê. Gava tevliheviyek he be, beriya her tiştî milletên di nav wî welatî de zirarê dibînin. Helbet çavê kurdan, dilê kurdan li ser welatê wan dişewite, lê ew êdî hîni welatên Sovyeta Berê bûne ku Qazaxistan jî yek ji wan welatan e. Helbet di başiya wan welatan de wê kurd jî baş bin, mixabin bivê nevê di xerabiyê de, wê kurd jî nesîbê xwe ji vê yekê bistînin. Hêviya me ew e ku aştî, biratî û azadî ji bo kurdan û ji bo hemû milletên di nav Qazaxistanê de pêk were...

Du mezin û hêjayên civaka Kurdên Qazaxistanê Nadirê Kerem Nadirov û Kinyazê Îbrahîm Mîrzojev êdî di navbera we de nîn in. Rehma Xwedê li wan be. Di zemanekî wiha de hûn çawa kêmasiya wan hîs dikin? Ger ew sax û li ba we bûna, gelo şîreta wan li we dê çi bûya?

Spas, mala we ava be. Helbet kêmasiya wan tu caran nayê dagirtin. Ez hê jî bawer nakim ew ji ba me çûne. Rast e bi awayekî fizîkî ew ne li ba me ne û ev pir zor e, lê ew her dem di dil û mêjiyê me de ne û heta em kurd he bin, wê ev rastî neguhere. Helbet herwekî berê niha li ba me bûna wê dîsa bigotana kurdperwer bin, ji bo Kurdî û ji bo kurdan bixebitin, bixwînin, guh bidin zanist û zanyariyê, qedrê dê-bavê xwe û mezinan bizanibin...

Xanima hêja, çalakvan û karsaza kurd Narîn Nadîrova, gelekî spas bo bersivên we yên hêja û giranbiha.

Spasî ji min! Ji bo kar û barê we û kovara we "The Hall Kurdiyê" serkeftin û serfiraziyê dixwazim...




NECAT ZIVINGÎ

RESMÊN NÛ YÊN WINDAYÎ YÊN CIZÎRÎ

Min jî bawer nekir. Çawa yanî? Çima heya niha kesî nebihîstîye? Demildest li erebeyê siwar bûm û bi rê ketim. Wexta gihîştim wî gundê asê yê di çîyê de roj çûbû ava. Hevala ku ji min re behs kir, got di quntara çîyê de şikeftê heye. Di nav gundîyan de wek tirbe tê zanîn û salê hinek rojan diçin ziyaretê jî. Qedexa ye birîna dar û şînahîyan li wê derdorê. Her wiha nêçîr jî. Kes newêre destê xwe bide ti tiştî. Tenê di wextên ziyaretê de diçin diayên xwe dikan, kêl û kevîran maç dikan û paçikan bi hinek daran vedikin. Ji bo daxwazên dilê wan pêk bê kevîrkên biçûk jî di tehtekê didin, heta pê ve bizeliqê. Lê ya ku kes newêre hundirê şikeftê ye. Tiştên pir ecêb tê de hene, haya kesî jê tune ye.

Hevala ez birim, berya du-sê salan bi xoşewîstê xwe re, bi nezanî ketîye wê şikeftê û wan perên pirtûkan bala wê kişandîne. Xoşewîstê wê pir tirsiyaye û nexwestîye destê xwe bide wan, lê wê bi nîvronahîya tavê li çendekan nihêrtîye û heyirî maye. Dibêje ew pîrebok in. Çûyîna wir ya şevê tirsnak û xetere bû. Lewma me çûna xwe hişt rojê...



Bi sedan çapên dîwana Hafiz (1315–1390) hene; cûr bi cûr. Pirên wan bi resm û nîgar û minyaturan xemilandî ne. Jinên ciwan ên sing û berê wan vekirî direqisin, qedehên meyê pêşkêşî dildarên xwe dikin. Yarên wan jhişçûyî, kûzên şerabê, sirûşt, teyr û her wekî din. Gelek îmge û metaforên balkêş. Di hinekan de li derdora mêrekî bi dehan jinên şox û bedew.

Dema em li seranserê dîwanên wan dinêrin; ger Hafiz reqsa xwe li derdora şerabê kiribe, Cizîrî ya xwe li derdora delalîyê kiriye. Lewma dîwana Cizîrî ji ya Hafiz layiqtirê wêne û dîmenên wan şox û bedewan e. Lê çima ew delal û şox û bedewên Cizîrî heya niha nehatine dîtin? Qet nebe nehatine resimandin? Çi ferqa me Kurdan, ji Farisan heye? Çima dîwanên Hafiz bi reqs û xulxulîna bedewan şên in, yê Cizîrî di kaxez û qewlikên hişk û ziwa de şîngirtî?

*

Îsmâil Cezerî (1136–1206) yek ji mînakên sereke ye, di cîhana misilmanan de ku resm û wêne û peyker çêkirine. Li Cizîr, Heskîf û Amedê jîyaye. Di sala 1206an de ev wêneyên xwe di pirtûka xwe ya bi navê Hîyel de jî resimandine. Weke ku Erebban dikin, serê resmên xwe jî nebirîne. Mûzîkjen û peykersazê di cîhanê de navdar, Leonardo Da Vîncî jî (1452–1519) ji wî Cezerî yê Kurd sîd wergirtîye.

Lê îcar hê pir berya Cezerî, di erdnîgarîya Aryanê de yekî weke Manî–Erjeng (216–276) derketîye, bi nîgarvanî û resamîya xwe nav daye li cîhanê. Xanîyê nemir di Mem û Zînê de wiha bal kişandîye ser: “Fehaşî te kir ji rengê Xanî / Neqqaşî te kir mîsalê Manî” Xanî jî di rastîya xwe de Mem û Zîn weke tabloyên resman neqışandîye. Erê! Helbet wê resmên nû yê Xanî jî derkevin.

Çanda resamî û nîgarvanîyê di nav Kurdan de jîyaye. Di sala 1655an de, dema Ewfiya Çelebî hat Bidlîsê, ji bo Ewdalxanê mîrê Kurd got “di resmê de mîna Behzad û Manî ye” û pesnê wî da.



Îcar aldarê işq û delalîyê, Cizîrî (1570–1640) 1300 sal piştî Manî, 500 sal piştî Cezerî hat û resmên xwe yên bi efsûn neqîşandin. Lewma dema wî û Mîr şî'r li ber hev xweş kirin, wî got "Xered [xaye] şiklê te bû Manî ji neqşên Çîn û Maçînê" û Mîr jî wiha lê vegerand: "Mîsalê sûretê Çînê xelet Manî xeta kêşa / Ku min dîbû li ayînê ji ber zulfa du ta kêşa."

Cizîrî, firçe girt destê xwe û dest bi resmê nû kir:

***Nebat û şekkera lêvê nesîmê wê gul û sêvê
Hilînit perdeya şêvê şifaya hindekî derd e***

Û xwe wek peyrewê Erjeng dît,
li ser resmê xwe yê ji ava sîm û zêr, wiha got:

***Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşikê bavê
Ku da Erjeng ji wê navê li ber rojê nebit perde***

Cizîrî bi xwe dizanî. Mîna meczûbên
işqê wî jî nedikarî bê delal û xûban bijî:

***Mela zanim ji meczûban, tinê najî tu bêxûban
Dema dil dî bi mehbûban, bi şox û şeng û esmer de***

Erê xwînerê! Erê xwînero! Ger tu nikaribî yekî weke Cizîrî ji kevanê (parantez) [alîyekî wê Hezretî, alîyê din Quddîsel-la] derxîni, ne pêkan e têbigihîjî û bibîni. Tu qet fikirî yî? He-ger Cizîrî di cîyê şî'ran de resm xêz bikira, gelo niha wê li hemberî me çi dîmen heba? Û wê kê, çi nêzîkatî nîşan bida, çawa şîrove bikira? Teqez! Pêwîstîya me bi Cizîrînasîyeke nû heye. Cizîrînasîyeke nû! Belkî bi wî awayî em li sirûştta xwe vegerin û rehabîlîte bibin.

Min behsa yek du resman kir. Yê din, belkî rojekê li pêşangeheke ezamet werin dîtin.



JIYANÊN KU BI PEYMANA ENQEREYÊ GUHERÎNE

Serpêhatiya
Gezo û Îzzet Bozkurt

Du dixorên Kurd ku li Diyarbekirê heyateke xweş û serkeftî dijiyan, ji ber çend sedeman rabûne û hatine li Londonê bi cî bûne. Du dildarên çand û zimanê Kurdî li vir ji xwe re jiyaneke nû ava kiriye. Êdî hedef û xeyalên wan ên nû hene. Çima û çawa ji paytexteke Kurdî koç kirin? Werin em bi hev re Gezo û Îzzet Bozkurt binasin.



Ez dixwazim di despêkê de hûn xwe bidin nasîn.

Gezo: Navê min Gezo Issu Bozkurt e. Ez dixtora zarokan im. Em bi Peymana Enqereyê hatin vir. Me Peymana Enqereyê li ser şopandina tenduristiya zarokan ava kir. Ez mezinbûn û girbûna zarokan dişopînim û di hin waran de testan çêdikim, dê û bavan perwerde dikim.

Îzzet: Ez jî Îzzet Bozkurt. Ez jî dixtorê diranan im. Berê li Amedê dixebitiam. Piştî xebata li Amedê bi qasî 9 salan em bi Peymana Enqereyê hatin vir. Niha ez wek dental hîjyenîst dixebitim. Di heman demê de, ez ji bo ezmûna wekheviyê ya dixtorîya diranan xwe amade dikim.

Haya we çawa ji peymana Enqereyê çêbû? We kengî serî lê da û hûn kengî hatin vira?

Gezo: Em di Tîrmeha 2019an de hatin vir. Di salên 2016 û 2017an de, me biryar da ku biçin Îngilîstanê. Me li ser vîzeyên cuda lêkolîn kir. Di dema lêkolînê de em hîn bûn ku tiştêkî bi navê Peymana Enqereyê heye. Yanî dema ku me biryara hatina Îngilîstanê da û li ser rê û rêbazan lêkolîn kir, em ji hebûna Peymana Enqereyê haydar bûn.

Îzzet: Rast e, me di despêkê de nedifikirî ku em bi saya Peymana Enqereyê werin.

Gezo: Belê, em qet li ser nefikirîn. Dûv re dema ku me dît ku ev eşkere rêya herî hêsan e, me serlêdan kir.

Sedem çi bû ku we xwest hûn herin derve û bi taybetî herin Îngilîstanê? Lewra dixtor li Tirkîyê pereyê baş qezenç dikin. Ma ne?

Gezo: Na, ne wisa ye.

Îzzet: Na, mixabin.

Îja hûn çima derketin? Qey sedema we jî ji ber rewşa aboriyê bû?

Gezo: Aborî jî tê de gelek sedem hene.

Jiyana we li memleket çawa bû?

Gezo: Pir xweş bû. Yanî em di warê aborî de ne kesên xwedî xeyalên mezin bûn. Û jiyana ku me li wir bi dest xist, besî me bû. Lê me bi pereyên ku bi dest xistibûn nekarîn jiyaneke bikirin. Me nikarîbû jiyana xwe bikirana. Me

nikarîbû siberoya xwe, siberoya zarokê xwe bikirana. Xaniyê mezintir, tirimbê-la lûkstir, zevî. Ez viya nabêjim. Ev ne jiyana e. Ez nabêjim sedem tenê aborî ye. Me tenê fêhm kir ku em bi pereyên xwe nikarin tiştêkî bikin. Ji ber vê yekê. Ez dixwazim bila zarokê min bi ewlehî bikare masî bigire. Ez vê bi Mercedesê nadim.

Îzzet: Yanî hem di warê qezencê de hem jî di warê tundiya li dijî dixtoran de.

Erê, hûn rîskek mezin digirin. Yanî rîsk, divê tu bê rawestan bixebitî, lê mejiyê te nikare wisa bixebite, tu ê xeletiyên bikî. Û ya ku hûn jê xelet in tenduristiya mirovan e. Hûn ji her kesî berpirsiyar in. Lê sîstem ti berpirsiyariya wê xeletiyê nagire ser xwe. Hûn rasterast berpirsiyar in. Û ji ber vê yekê, tabloyeke pir xirab çêdibe ku her kêlî her roj were ber çavên we. Dibe ku hem wijdana we bêzar be hem jî ji hêla aborî ve hûn aciz bibin.

We got me di sala 2016an de biryara derketina ji welêt da. Tesîra bûyerên sala 2015an û şerê xendekan di vê biryara we de heye?

Îzzet: Niha, ya rast, ez qet nefikirîm ku biçim derve. Ji ber vê yekê ez gelekî girêdayî bajarê xwe bûm û heta niha jî gelekî girêdayî wan deran im. Gelek planên min hebûn. Ji bo her salê, ji bo piştî 10 salan, piştî 20 salan, ji bo zarokan. Lê gava hêvî li derekê qut bibe, êdî mirov nikare tiştêkî bike. Ev bi rastî girîng e. Lê jina min her gav dixwest, ji kengî ve digot em herin. Piştî bûyerên 2015an li Tirkîyeyê, li Nisêbîn, Cizîr, Sûrê. Li wir xeyalên min şikestin. Hêvî têk çûn. Bawerî nema. Mesela kuştina Tahîr Elçî; nimûneyeke mezin a vê yekê ye. Derbeke mezin li min xist. Û bi rastî min hêviya xwe winda kir. Min hêviya xwe ji me winda kir. Ez li wir şikestî bûm. Û min li wir ji jina xwe re got, rabe, em herin. Min got ez naxwazim zarokên xwe li vir mezin bikim. Min got hêviya min tune ku dê baştir bibe. Hê jî hêviya min tune bi rastî. Piştî wê rojê me ev biryar da. Me got em biçin welatên Ewropayê bigerin, kîjan li me tê, em lê bi cih bibin.

Lewra ewila ewil ya muhîm ji bo me zarokê me bû, faktora yekem perwerdehiya zarokan bû. Ya duyemîn, me got bila ew der bibe cîhekî wisa da ku em jî jê hez bikin. Bila ew der bibe cîhekî ku em hem lê bijîm û hem jî bex-tewar bin.

Em di sala 2017an de hatin Îngilîstanê û me gelekî ji Îngilîstanê hez kir. Di warê perwerdehiyê de me pir eciband. Em çûn Oxfordê. Me ziyaret kir. Bivê nevē hûn ê vira û bi welatê me bidin ber hev. Di wê demê de, gava li gelek welatên Rojhilata Navîn, li Sûriyê, li Iraqê, li Tirkîyê berhemên dîrokî dihatin xirab kirin, hûn dibînin ku ev dibistana nizanîm ji kîjan sed-salê maye, hê jî li ser xwe ye û hîna destnedayî ye. Heta nîşana li ser dîwêr ya orjînal hê jî heye. Wan ev berhem parastiye heta niha. Wê demê hevalên me yê ku digotin, “Tu dîn î, çima diçî?” niha jî dibêjin em ê çawa werin?

Niha ev jî heye. Em bêjin we got em diçin welatekî din. We mal bar kir, hûn hatin û we li vir dest bi jiyaneke nû kir. Evqas hêsan e gelo?

Gezo: Her çiças ez xwe nebaş hîs bikim jî, rojekê jî ji biryara xwe poşman nebûm. Hevserê min jî wisa ye. Lê bi min re valahiyeke pir cidî jî çêbû. Gotina hesret cihê vê nagire, bi min ev valahiyeke e. Belê ez dixwazim li vir bimînim, ez dixwazim li vir bijîm. Ez her roj bi kesên nû re dipeyivim, jiyana min a rojane baştir dibe, lê gava ez li paş xwe dinêrim, çavên min dîsa li heman firinê, li heman marketê digerin. Dîsa dixwazim telefonî hevalên xwe bikim û dîsa em bi hev re çay û qehweyê vexwin. Navê vê hestê li ba min valahî ye. Vê yekê nêzî 6 mehan dewam kir. Li mala me ya ewil Îzzet zû radiza. Ew zehf dixebitiya. Piştî ku min Robîn jî radizand, ez bê sedem digiriyam. Lê piştî 6 mehan, ez êdî hînê vira bûm. Piştî hînbûnê niha jî hesret heye. Bîrêkirinê destpê kiriye niha.

Îzzet: Piştî roja ku me biryarek wiha girt, rewşa li Diyarbekirê roj bi roj xirabtir bû. Rewşa Tirkîyê bi giştî xerabtir bû. Min zanîngeh jî li derve



xwend. Ez her tim ji malbatê dûr bûm. Min kêr û zêde bi van zehmetiyan dizanibû. Loma beriya ku ez bê m vir, min nexwest tiştekî li Amedê bihêlim. Lewra min dizaniya dema ku em bi zehmetiyan re rû bi rû bimînin, em ê bixwazin vege-rin. Yanî helbet di rojên ewil de ji bo min jî zehmet bû. Ez wek dixorê diranan hatim. Ez hatim li vir bûm asîstan. Min li Amedê asîstan perwerde dikirin, lê li vir ez bixwe bûm asîstan. Lêbelê şikir niha belgeyekê min heye. Û li welêt di demeke ev çend kin de bi rastî zehf tiştên xirab çêbûn. Tam em dikin têkevin depresyonê, em serê sibê li nûçeyan guhdarî dikin û paşê moralê me baştir dibe. Helbet em bi rewşa li welatê xwe gelek diêşin lê dîsa jî em dibê m me baş kir ku em hatin.

Ez dixwazim vê yekê jî bipirsim. Hûn ji bo pêşeroja xwe û perwerdehiya zarokên xwe hatin. Gava hûn bajarê xwe yê berê û yê niha bidin ber hev, bi we ev der çawa ye? Hûn çi hîn bûn ji vir?

Gezo: Mînak dema ku em hawirdora xwe ya li vir û ya li wir bidin ber hev, rewşek bi vî rengî heye. Dema em hatin vir ez nêzî 35 salî bûm. Ji ber vê yekê ezmûna me ya 35 salan heye. Ew hevaltî ji bo min pir bi qîmet in. Li vir tenê 2 salên me derbas bûn. Dîtina hevaltiyên wisa hêja ne hêsan e. Ev kêmasiya me ya herî mezin e. Li vir, bo nimûne, em di valahiyeke civakî de dijîn. Em Kurd in. Di warê xebatên çandî de gelek tişt dikare bê kirin. Di wê warê de birçîbûneke mezin heye, valahiyeke heye. Lê tiştekî nayê kirin. Loma bi rastî jî pêdivî ye ku meriv hinekî organîze bibe. Ev, yek ji kêmasiyên me yê mezin e.

Li Londonê bi deh hezaran Kurd hene. Li vir ewqas Kurd hene lê ew civata ku hûn lê digerin tune ye. Bi ya we ev ji ber çi ye?

Îzzet: Li gor serjimêriya sala 2021ê 254 hezar Kurd li Keyaniya Yekbûyî dijîn. Ez ji we re bibêjim ku nakokiyek mezin heye. Ger 15 malbatên ji neteweyekê li heman dibistanê serî li dibistanê bidin û bêjin em ji filan civakê ne, em perwerdehiya bi zimanê xwe dixwazin. Dibistan ji wan re mamosteyan peyda dike, dersan vedike û bi zimanê wan ê dayikê dersê dide. Kurdên ji Tirkîyeyê serî li piraniya van dibistanan dan, lê serlêdana wan ji bo Tirkî bû. Belê, bila serî li Tirkî bidin, lê bila ji bo Kurdî jî serî lê bidin. Mixabin, ev hest bi wan re nîne. Mînak ez gelek kesan dibînim. Ji min dipirsin “Tu Tirk î?” Ez dibêjim, “Na, ez

Kurd im.” Dibêjin Tirk-Kurd ferq nake. Na, ferq dike. Çima ferq nake? Ma tu dikarî ji Îskoçekê re bibêjî tu Îngilîz î? Ka tu bêje, ew ê ji te re çî dibêjin? Ew ê ji te re bêjin cahil. Dema ez vê dibêjim, tu dibînî dibêje esas ez jî Kurd im. Ji ber hin sedeman bi rastî ti têkiliyên wan bi çanda wan re nînin. Îngilîstan ji bo kariyer, perwerdehî û qezenckirina pereyan welatekî pir baş e. Loma derdê wan kesên ku em behsa wan dikin tenê pere ye, her tiştî din paşguh dikin.

Gezo: Em vê kêmasiya çandî ji dil hîs dikin. Em dizanin ku malbatên mîna me jî li vir hene. Piştî qedandina kariyerê, xewna me ew e ku em maleke çanda Kurdî bi taybetî ji bo zarokan ava bikin. Tê de tenê muzîk, vegotina çîrokan û şanoyên piçûk ên zarokan hebin.

Pirsa min a dawî. Gava hûn li paşiya xwe binêrin, xweziyeke we heye? Tiştê ku tu bêjî xwezî min ev jî bikira.

Gezo: Ya min heye. Her perçeyek welatê min bi rastî xweş e, xwezî em bêtir geriyana. Yanî ji ber ku min li navçeyê Diyarbekirê, li gundekî dûr, sûlavê nedîtiye û ez nekarîme biçim wan deran, ez hinekî diêşim.

Îzzet: Ez jî dibêjim xwezî ez zûtir bihatima vira. An piştî ku zanîngeh qediya an jî piştî zewacê divê em hatibana.

Çima?

Îzzet: Min ji hevsera xwe re digot xwezî em hatibûna. Wê demê em dikariyan pir zûtir pêşde biçin. Û xwezî wek Kurd em zûtir bibûna perçeyekî welatekî wisa bi hêz. Qesta min ji Kurdê ku bi Kurdî diaxive. Ez behsa Kurdê ku ji çanda xwe hez dike û mîna Kurdan dijî dikim.

Tiştêkî din ku hûn bixwazin bêjin heye?

Îzzet: Ez dixwazim behsa xaleke din jî bikim. Di navbera Tirkiye û Îngilîstanê de ferqeke mezin ya kedê heye. Mînak, wek dixtorê diranan ez li vir jî li Tirkiyeyê jî heman karî dikim.


Em bêjin eger ez li nexweşekê binêrim û heman prosedûrê bikim, ez dikarim bi pereyê ku ji wî karî qezenc dikim amûrekê bikirim. Amûrek ku ez ê di karê xwe de bikar bînim. Mixabin divê ez li Tirkiyeyê herî kêr li 20 nexweşan binêrim da ku bikaribim wê amûrê bikirim. Helbet cizayên pergala ku di pratîkê de we kontrol dike pir giran in û dezavantajên wê jî hene. Lêbelê, dîsa jî ev rehetir e. Ji xeynî wê, Îngilîzî îro di cîhanê de zimanê herî berbelav û bihêztirîn e. Bûye zimanê zanistê, bûye zimanê teknolojiyê. Bi rastî, yek ji wan sedemên ku em anîn vir jî zimanê Îngilîzî ye.

Gezo: Wek dixtora zarokan, ez bi tenduristiya gel re pir eleqedar im. Û dema ez li Diyarbekirê bûm, dema ku pir zêde dixebitiam jî, kesên mexdûrên şer û yê li kampan dihatin. Û ez jî bi qasî ku ji destê min dihat bi dilxwazî dixebitiam. Min hewl dida ku ji bo wan jî hin xizmetan pêşkêş bikim. Ez bi heman hestan li vir im. Û niha ez dixwazim bibim dixtoreke global. Di pêşerojê de, ez ê hewl bidim ku piştgiriya girseyên ciwan bikim, nexasim yê mexdûr, belkî penaber, an jî zarokên malbatên ji welatên cuda yê ku pirsgerêkên wan ên ziman hene.

Ez gelek spas dikim. Hêvîdar im hûnê bi ser kevin.

Peymana Enqereyê Çi Ye?

Peyman di sala 1963an de di navbera Civaka Aboî ya Ewropayê û Tirkiyeyê de li Enqereyê hatiye îmzekirin. Ji ber ku Brîtanya par jî Yekitiya Ewropayê derket, ev peyman ji bo vî welaî betal bû. Li gorî wê peymanê welatîyekê ji Tirkiyê gava serî lê bida dikariya li Brîtanya şirketekê ava bike û li vir bixebite. Piştî 6 salan gava her her tiştî we bi rêkûpêk be, Brîtanya mafê hemwelatîbûnê dide we. Di 3 mehên dawîn yê sala 2020ê de dora 30 hezar kesî ji Tirkiyeyê serî li vî peymanê da.





DALEEL HAGY

Damezrîner û Revebirê
Trees Against Povertyê

LI DIJÎ XIZANIYÊ DARAN BIÇÎNE!





Şerê li Sûriyê bi milyonan kesî ji der kirine. Yên ku li nava Sûriyê mane jî li bajarên din bûne koçber. Bes li parêzgeha Heskê 900 hezar penaber dimînin. Piştî şer, pirsqirêka herî mezin li wir xizanî ye. Kesên karmend (mamoste, hemşîre, endezyar, parêzer, hwd.) rojê bi £2 poundan ji bo debara xwe dixebitin. Lê derfetên kar gelekî kêmtir in. Hinek ji xelkê jî ji nava çop û gemariyan nan û xwarina xwe ya rojane berhev dikin.

Ji aliyê din ve dever ji hêla hêşînahî û daran ve jî gelek feqîr e. Rejîma Baasê bi salan siyaseteke wisa qirêj li Bakurê Rojhilata Sûriyê meşandiye ku nehîştîye li wir dar bîne çandin.

Ji bo ku em hem hawirdoreke hêşîn ava bikin û hem jî alîkariyê bigihînin malbatên xizan, me projeyekê da destpê kirin.

Trees Against Poverty!

Ez ê ji we re behsa wê projeyê bikim.

Darekê biçîne jiyaneke biguherîne!

Çandina daran çiqas dikare alîkariya penaberên li Bakurê Rojhilata Sûriyê û Herêma Kurdistana Iraqê bike?

Darên Dijî Xizaniyê (Trees Against Poverty-TAP) destpêkeke nû ya neqezencê ye ku armanca wê çandina daran li Bakurê Rojhilata Sûriyê û Herêma Kurdistanê ye. Rêxistin, karê çandinê û lînêrîna daran di de penaber û kesên derbider, da ku alîkariya wan bike. Dar dê ji wan re bimîne û ew ê ji ber û fêkiyên daran bixwin û wana bifroşin, her wiha debara xwe pê bikin. Rêxistin, armanca dike ku derfetên kar ji penaber û awareyan re biafirîne û deverê hêşîntir bike.

Weke mînak parêzgeha Heskê li Bakurê Rojhilata Sûriyê bi qasî Belçîkayê mezin e lê îro hema ti dar lê nemaye...

Li Îngilîstanê ji bo her 25 kesan dora 625 dar hene. Eger em wê bi parêzgeha Qamişlo û Heskê bidin ber hev, ji bo 25 kesan tenê 1 dar heye.



Ma çandina darekê bi rastî dikare jiyaneke biguherîne?

Li Bakurê Rojhilatê Sûriyê wek nimûne, nîrxê diravê Sûriyê di 10 salên dawî de daketiye. Profesyonelên wek mamoste, hemşîre, endezyar, parêzer, ...hwd. bi navînî li dora £2 (Sterlîn) an kêmtir di rojê de qezenc dikin.

Wek nimûne wêneyên jêrîn nîşan didin ka bi mûçeyeke rojane ya mamosteyekê çiqas dikare bê kirîn? Me dema berî şerê li Sûriyê û dema niha dan ber hev.

Mûçeya rojane ji bo kirîna xwarinê - berî şer	Mûçeya rojane ji bo kirîna xwarinê - aniha
	

Ne bi tenê mûçe pir kêr in, di heman demê de derfetên kar jî pir kêr in. Li ser van hemûyan jî dora 900 hezar aware li parêzgeha Heseke hene ku ev hejmar penaberan dike sêyem ji nifûsa wê derê.

Bi projeya Trees Against Poverty em texmîn dikin ku çandina 42 daran dê derfetên kar peyda bike ku malbatekê pê bikare salekê debara xwe bike û bi vî rengî bi çandina darekê dikare jiyaneke biguherîne.

Trees Against Poverty hewl dide ku bi têkoşîna li dijî xizaniyê û afirandina pêşerojê hêşîntir bigihîje vîzyona xwe:

1. Çêkirina derfetên kar.
2. Bi çinîna daran re çêkirina çavkaniyê xwarinê.
3. Firotna dextl ji bo peydakirina dahatê.
4. Bihêzkirina aboriya jinê û mezinbûna ji her hêlê ve.
5. Vegerandina nasnameya çandî.
6. Di sirgûnê de xwedîkirina çandiniyê wekî amûrek dermankirinê û başkirina derûnî.
7. Ji nû ve daristanên erdnigariyên xerabûyî, jinavbirina CO2 û şerkirina guherîna avûhewayê.
8. Çêkirina qadên hêşîn ên ku bedewiyê çêdikin û cîhê ku penaber lê dijîn çêtir dikin.
9. Ji bo heywanan jîngeh bîn vegeandin û li dijî kêmbûna cihêrengiya biyolojîk şer bikin.

Trees Against Poverty teknolojiyê tîne platforma xwe

Kes û şirketên ku malpera rêxistinê bikartînin dê karibin ji dûr ve daran biçînin û mezinbûna wan bi awayeke online bişopînin.

Sponsor dikarin malperê bikarbînin, da ku darek ji lîsta vebijêrkan ji xwe re hilbijêrin û wê darê bidin çandin û navek jî lê danin. Wek nimûne, hûn dikarin dara hêjîrê biçînin û navê xwe an navê zarokê xwe lê bikin.

Mirov dikarin malpera Trees Against Poverty bikarbînin, da ku wek diyarî daran bidin hev. Mînak; li rojên wek rojbûn, çêbûna zaroka nû, dawet...hwd. hûn dikarin biçin malperê, agahiyên kesê ku hûn dixwazin darê diyarî wî/wê bikin binivîsin. Û em ê jî wek TAP bi vî diyariya we ji wan re surprîzê bikin.






Sponsorên darekê dê cihên dara xwe wek lokasyona GPSê bistînin, û her wiha ew ê du salan wêneyên birêkûpêk ên dara xwe ya sponsorkirî bistînin û bibînin ka ew dar çawa mezin dibe.

Armanca me





Trees Against Poverty armanc dike ku heta sala 2025an 62,000 daran biçîne. Bi vî rengî 62 hektar zevî dê ji nû ve bê çandin û çavkaniyê dahatê ji bo 738 malbatên mexdûrên şer bê peyda kirin.


Trees Against Poverty kompaniyeke civakî û ne-qezencê ye. Ji bo berjewendiya civakê li Keyaniya Yekbûyî hatiye damezrandin. Her wiha hûn dikarin agahiyên bêtir ji van hesabên me yê medya civakî hîn bibin :

Biçin malperên me:

-  treesagainstpoverty.org/
-  [treesAgainstPoverty](https://www.facebook.com/treesAgainstPoverty)
-  [tree_vs_poverty](https://twitter.com/tree_vs_poverty)
-  [company/trees-against-poverty](https://www.linkedin.com/company/trees-against-poverty)
-  [treesagainstpoverty](https://www.instagram.com/treesagainstpoverty)

Ev projeyê alîkariyê ye ji bo xelkên koçber û penaber li Sûriyê û Herêma Kurdistanê. Hun jî darekê biçînin û jiyaneke biguherînin.

			
Quantity: <input type="text" value="1"/>	Quantity: <input type="text" value="1"/>	Quantity: <input type="text" value="1"/>	Quantity: <input type="text" value="1"/>
<input type="button" value="ADD TO CART"/>	<input type="button" value="ADD TO CART"/>	<input type="button" value="ADD TO CART"/>	<input type="button" value="ADD TO CART"/>
Fig Tree £16.50	Apricot Tree £16.50	Persimmon Tree £16.50	Pine Tree £16.50



LI TE DIFIKIRIM

Ji Farisî: ZANA ZENGENÎ, 2016

m.zana47@gmail.com

“Li te difikirim
Weke xeta bi noqte
Weke herfa elîfbêya bi ‘eyn
Weke herfa elîfbêya bi Şîn
Weke herfa elîfbêya bi Qaf.

Herweha
Min çî gotiye;
Ji ber tatêla gihandina bi hêsanî ya van her sê herfên dawîn bû.
Niha divê ez razê,
Ez ê sibê dîsa li te bifikirim,
Weke deryayê li dewamiya xwe.


Seyîd Elî Salihî



Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingehêka sazgehîyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

Kovarên Endam



www.facebook.com/KovargerênKurd
KovargerênKurd@gmail.com

The **Hall** Kurdî
Endama Koma Kovargerên Kurd e